ISSN: 2149-2751
e-ISSN: 2149-2751
International Journal of Kurdish Studies
http://www.ijoks.com/

Research Article

International Journal of Kurdish Studies
11 (1), pp. 151-175
http://www.ijoks.com

# Kevneşopîya Mewlîdê li Nav Kurdan û Rola Wê Di Edebiyat û Çanda Kurdî De (Bi Mînaka Kurdên Tirkîyê)

***Halil AKÇAY***[1]

**Received**: Feb 2, 2025 **Accepted**: Feb 18, 2025

## Kurte

Hêmanên olî, çandî, civakî û edebî yên îroyîn bi berhevkirina mîrateya qedîm a ku ji mêj ve weke jiyan û bawerî ketiye jiyanê, derketine holê. Misilmanan wek endamên dînê Îslamê, li ser kelecana jidayikbûna cenabê Pêxember (s.a.w) berhemên devkî û nivîsî yên bi navê "mewlîd"ê çêkirine. Berhemên mewlîdê, ku mînakên wan ên pêşîn di edebiyata erebî de peyda dibin, paşê xwe di edebîyata kurdî de nîşan didin. Di vê lêkolînê de behsa tevkarîya mewlîdên ku xwedî bandoreke mezin a wêjeyî û çandî ne, ji wêje û çanda kurdî re tê kirin. Di serî de, piştî ku ferheng û wateya bêjeya mewlîdê derdikeve holê, di warê nivîsandin û pîrozkirina wê de dîroka mewlîdê ji demên pêşî heya roja me ya îro hatîya vegotin. Armancên sereke yên lêkolînê ew in ku di warê ziman û naverokê de li ser mewlîdên kurdî, merasîmên ku di dema xwendina mewlîdê de pêk tên û bandorên çandî yên van merasiman de mijûl bibin. Çavkaniyên lêkolînê ji Mewlûdên Kurdî, pirtûkên pêwendîdar û bi giranî welatiyên li herêmê dijîn û mele, waîz, muftî û akademîsyenên herêmê pêk tên.

**Peyvên Sereke:** Edebiyat, Edebiyata Kurdî, Çand, Mewlîd, Merasîm

**Recommended citation:**
Akçay, H. (2025). Kevneşopîya Mewlîdê li Nav Kurdan û Rola Wê Di Edebiyat û Çanda Kurdî De (Bi Mînaka Kurdên Tirkîyê). *International Journal of Kurdish Studies,Volume 11* (1), 151-175,
**DOI**: **https://doi.org/10.21600/ijoks.1631834**

[1] Assoc. Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye, e-mail: halilakcay@artuklu.edu.tr
**ORCID**: https://orcid.org/0000-0002-1671-5073

**Mawlid Tradition of the Kurds and Its Contribution to Kurdish Literature and Culture in the Case of the Kurds of Türkiye**

**Abstract**

Over time, today's religious, cultural, social and literary elements have emerged along with an accumulation of an ancient heritage that has come to life as a way of life and belief. In this vein, Muslims, as adherents to the religion of Islam, have produced verbal and literary products called Mevlit (Turkish). The Mevlit are based in enthusiasm for the birth of Muhammad, messenger of Allah. Mevlit works, first examples of which are encountered in Arabic literature, later show themselves in Kurdish literature. The present study includes a discussion on the contribution of these mawlid (Arabic) in view of the great literary and cultural influence on Kurdish literature and culture. Initially, the dictionary meaning of the Turkish word "Mevlid" once provided, the history and the writing and celebration of the Mevlid from the first periods to the present day is discussed.

**Keywords**: Literature, Kurdish Literature, Culture, Mevlid, Ceremony

**Destpêk**

Her ol û bawerîyê bi awayên curbecur bandor û tevkarî li endamên xwe kiriye. Hatina dînê Îslamê jî di warê zanistî, exlaqî, siyasî, civakî, aborî, edebî û çandî de li erdnîgariya misilmanan şaristaniyeke bilind afirandiye. Her çalakî û hêmanên vê olê ji bo çand û edebiyata misilmanên cîhanê tevkariyeke mezin kiriye. Yek ji van hêmanan jî mewlîd e ku li ser jidayikbûna Pêxemberê me Muhammed (s.a.w) hatiye avakirin.

Peyva mewlîd (مَوْلِد) ji koka herfên ولد hatiye, ku mesderê wê vilāde (وِلادَة) ye. Wateya bingehîn a vê peyvê ew e ku jin zarokê xwe tîne dinyayê. Forma pasîf a lêkerê di vê rehê de (وُلِدَ) maneya "bûn, çêbûn, xuyabûn" e. Peyva mewlîdê di wateya "cîhê jidayikbûnê, dema jidayikbûnê, çêbûn" de tê bikaranîn (Ezherî, b.t.: XIV, 179; İbn Menzur, b.t.: III, 468).

Wek têgîneke çandî ya îslamî, têgeha mewlîdê ne tenê ji bo jidayikbûna Pêxemberê me (s.a.w) hatine nivîsandin, her wiha behsa berhemên ku bi vê minasebetê hatine nivîsandin û merasîmên ku hatine lidarxistin jî dike. Mewlîd her çend di serdema destpêkê ya dîroka Îslamê de

tenê ji bo jidayikbûna Pêxemberê me (s.a.w) dihat xwendin, heya îro jî di salvegerên jidayîkbûn an mirina kesayetiyên mezin ên zanistê de dihat xwendin. Lê bi berfirehkirina qada mewlîdê, mewlîd di her cure kêliyên şahî û xemgîniyê de, wek dawet, mezûnbûn, kar, sinet, sersaxiyê jî tê xwendin (Çağmar, 2004: 13; Özel, 2004: XXIX, 475).

Cejna mewlîdê di dîroka Îslamê de ji serdema Pêxemberê me (s.a.w) dest pê kiriye. Lewra dema ku Resûlê Xuda (s.a.w) roja duşemê rojî girtiye, ji wî re li ser fezîleta rojiya wê rojê hate pirsîn. Wan wiha bersiv da ye: "*Di wê roja ku ez hatim dinyayê û bûm pêxember (an jî wehiy hatiye jî min re).*" (Muslîm, Siyam, 197-198). Li gorî vê yekê Pêxemberê me ne tenê di salvegera wîladeta xwe de, her hefte jî roja jidayikbûna xwe pîroz dikir. Lêbelê, pîrozkirina wî tenê bi îbadetê bû. Di nav misilmanan de jî kesên ku rojiya duşemê digirin hene. Ji xeynî vê, behsa îbadet û ayînekê nayê kirin. Dema ku em li dîroka mewlîdê di warê pîrozkirina wê ya weke merasîmekê de dinêrin, tu agahiyek ku merasîmên mewlîdê di serdema Pêxemberê me (s.a.w), Sehabeyan, Emewiyan û Ebbasiyan de hatine kirin, nîne. Salvegera jidayikbûna Pêxemberê me (s.a.w.) cara ewil li Misirê bi merasîmên fermî di dema Muîz-lîdînîllah di serdema Fatimiyan de dest pê kiriye. Di dewra Fatimiyan de li kêleka mewlîda Pêxemberê me bi navê "el-Mevâlidu's-sitte" mewlîdên Elî, Fatime, Hesen, Huseyn û xelîfeyê serdemê jî hatine pîrozkirin. (Îbnu't-Tuveyr, 1992: 217; Özel, 2004: XXIX, 475). Dema ku tê serdema Eyubiyan, her çend merasîmên pîrozkirina mewlîdê hatin rakirin jî, ji aliyê gel ve li malan hat pîroz kirin. merasîmên mewlîdê di dema Atabegê Erbîlê yê Eyubiyan Muzafferuddîn Kokborî (m. 630/1233) de, bi awayekî fermî dest pê kir û di demeke dirêj de, ji Muherremê heta Rebîulevvelê belav bûye. Di van rojan de gelek huqûqnas, sofî, waiz, qurrâ û helbestvan diherikîn bajarên wek Bexda, Mûsil, Cezîre, Sincar, Nisêbîn û ji welatê Farisan ber bi Hewlêrê ve û bi sultan û rayedarên dewletê re beşdarî merasîma mewlîdê bûn (Îbn Xellikan, b.t.: IV, 117-118). Di vê navberê de dema ku muhaddis û dîroknasê Endelusî Îbnî Dîhye el-Kelbî (m. 633/1235) di sala 604/1207an de serdana Hewlêrê dike, dibîne ku salvegera jidayîkbûna Pêxember bi merasimên mezin hatiye pîrozkirin, mewlîdek bi nâvê *et-Tenvîr fî mewlîdi's-sîrâci'l-munîr* nivîsiye û pêşkêşî Muzafferuddîn Kokborî kirîye. Kokborî jî 1000 dînar bexşî wî kirîye. (Îbn Hallikan, b.t.: III, 448-450).

Cejna mewlîdê di serdema Memlukan de jî berdewam kirî ye. pîrozbahiyên ku ji serê meha Rebîulevvelê piştî nimêja nîvroyê ya roja mewlîdê, xelîfeyê Ebasî yên Misrê, serokên hakimên

her çar mezheban, alim û seyda, emîr û fermandar, dewletparêz, navdarên gel û nûnerên welatên cîran dihâtin qesra Qahîreyê û di konê merasîmê de cihê xwe digirtin. Pêşî Qur'an dihat xwendin, paşê xutbe di hatin dayîn û ji teref endamên mezhebê ve zikr û ayet di hatin xwendin û paşê xwarin di hat xwarin û sedeqe li kesên hewcedar di hat belavkirin. Li Misrê her çend celebên pîrozbahiyê ji hev cuda bin jî merasîmên mewlîdê heta îro berdewam dikin. (Özel, 2004: XXIX, 476).

Her çiqas di serdema Osmaniyan de di serdema Miradê sêyemîn de pîrozbahiyên mewlîdê bi awayekî fermî dest pê kiribe jî, tê zanîn ku di demên berê de jî pîrozbahiyên ne fermî dihatin lidarxistin. Di pîrozbahiyên li Mizgefta Sultan Ehmed de sultan, wezîr, şêxu'l-Îslam, wezîr, kazaskerên Anatolya û Rumelî, rayedarên din ên sivîl û leşkerî û aliman bi cil û bergên xwe yên fermî amade dibun. Dîsa di serdema Osmaniyan de 12ê meha Rebîulevvel li Medîneyê cejneke fermî bû, ji qesrê top hatin avêtin û wê rojê dikan nehatin vekirin. Mirov bi kincên xweşik li dora xwe digeriyan û hevdu pîroz dikirin û wê şevê li Mizgefta Pêxember dihat ihyakirrin. Serê sibê hedîs dihatin xwendin, ji bo siltanan dua dihatin kirin û herî dawî jî mewlîd dihat xwendin. Paşê xwarin li gel dihat belavkirin. (Sabri Paşa, 2004, II, 513-517; Özel, 2004: XXIX, 477). Tevî ku li Tirkiyeyê pîrozbahiya fermî ya mewlîdê piştî ragihandina Komarê hat betalkirin jî, li ber çavên raya giştî her tim bi eleqeyeke mezin hatiye pîrozkirin. Her wiha îro wek Qendîl a Mewlîdê rojbûna Pêxemberê me bi çalakiyên curbicur ji aliyê Serokatiya Karên Diyanetê û Weqfa Diyanetê ya Tirkiyeyê ve tê pîrozkirin. Ev çalakiyên ku di sala 1989'an de bi navê "Hefteya Rojbûna Pîroz" dest pê kir û carna li gorî salnameya Hicrî û carinan jî li gorî salnameya Mîladî pêk tê, bi rêziknameya ku di sala 2010'an de hat weşandin bû hefteyek fermî ya pîrozbahiyê. Bi rêziknameya nû ya ku di sala 2017an de hat derxistin, navê hefteyê bû "Hefteya Mewlîda Nebî" û rojên pîrozbahiyê jî li gorî salnameya Hicrî ji roja dozdehê meha Rebîûlewwel hat guhertin. (Özel, 2004: XXIX, 477-478). Di encamê de, pîrozbahiyên têkildarî salvegera jidayîkbûna Pêxemberê me (s.a.w) wekî hêmanek girîng a jiyana olî û civakî di hemû civakên misilmanan de wekî nîşana hezkirina pêxember tê pîroz kirin.

### 1. Mewlîd Di Warê Berhema Nivîsî de

Di merasîmên mewlîdê yên berê de ayetên Qur'anê dihatin xwendin û Qesîdetu'l-Burde ya Kab b. Zuheyr û medhiyên Hessan b. Sâbit û Ebdullah b. Revâha û hin sehabeyên din ji û

helbestên wek *el-Kevâkibu'd-durriyye* â îmam Busirî ku ji bo Resûlê Xuda (s.a.w.) nivîsandibûn dihatin xwendin. Paşê dest bi nivîsandina mewlîdan hat kirin ku bi taybetî di pîrozbahiyên mewlîdê de bên xwendin. Her çendî tê nîqaşkirin bê kê pêşî mewlîd nivîsandiye jî, mewlîda yekem berhema Ebu'l-Ferec el-Cevzî ya bi navê "Mevlîdu'n-Nebî" an jî "Arus" e. *et-Tenvîr fî mevlidi's-sirâci'l-munîr* ku Îbnî Dihye el-Kelbî bi şîretên Eyûbîyan Atabegê Erbîlê Muzafferuddîn Kökbörî di sala 604/1207 de nivîsîye, wek yekem mewlîdê ku bi beyt hatiye nivîsandin navdar bûye. Lê beriya van ji behsa mewlîdên Kîsâî, Waqidî, Xezalî û Sibt Îbnu'l-Cevzî jî hatiye kirin. Ji xeynî van mewlîdên Erebî yên Lîsaneddîn Îbnu'l-Xetîb, Îbn Xeldûn, Meqqerî, Berzencî, Bustencî, Îbn Hecer el-Heytemî, Munâvî, Nebhanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Şêx Mihemed Emînê Heyderî jî hene. (Çağmar, 2004: 18-19; Tıraşçı, 2013: 212). Her çend li cîhana tirkan nêzî 200 mewlîdên nivîskî hebin jî, *Vesîletu'n-necât* a Suleyman Çelebî ya herî navdar e. (Tıraşçı, 2013: 211-213; Ertekin, 2011: 3; Özel, 2004: XXIX, 477-478; Akçay, 2013: 397).

## 1. Mewlîdên Kurdî

### 1.1. Nivîsandina Mewlîdên Kurdî

Mewlîda Mele Huseyn Ertûşî ku bi navê "Mewlîda Bâteyî" tê naskirin, wekî mewlîda kurdî ya yekem tê zanîn. Mewlîda navborî bi Kurdîya Kurmancî hatiye nivîsandin. Beriya wê jî di merasimên mewlîdên di nav kurdan de mewlîdên erebî dihatin xwendin. (Doskî, 2015: 139-140). Her çiqas navê nivîskarê mewlîdê yê bi navê Bateyî bi awayên cuda wek Mele Hesen, Mele Huseyn, Mele Ehmed û Mele Mihemed hatiye binavkirin jî, ji aliyê lêkolîneran ve hatiye eşkerekirin ku navê rast Mele Huseyn e. Hat diyarkirin ku navên din navên birayên wî ne. Tê gotin ku nisbeya Bateyî girêdayî Batê gundê nivîskar û nisbeya Ertûşî jî bi eşîra Mele Huseyn ve girêdayî ye. Di derbarê roja jidayikbûna Bateyî de nêrînên cuda hene. Kesin hene ku dibêjin ew di navbera salên 1417-1495an de jiyaye. Yên ku dibêjin ew di navbera sedsalên 17-18an de jiyaye jî hene (Ertekin, 2014: 188-189; Karacan û Aykut, 2015: 126; Akın, 2019: 18-20).

Mewlîda Bateyî li gorî serdema xwe belkî bi zimanekî zelal û têgihîştî hatiye nivîsandin. Tê zanîn ku piştî Bateyî, ji ber ixtilafên li ser serdema ku ew tê de jiyaye, bi qasî pênc sedsalan tu mewlîd bi kurdî nehatine nivîsandin. Ji ber çend sedeman mirov dikare vê rewşê rave bike. Ya yekem ew e ku mewlîda tirkî ya Suleyman Çelebî û mewlîda kurdî ya Bateyî ji aliyê raya giştî ve bi hêsanî tê fêmkirin. Ji ber ku kurd jî wek gelên din ên ku heta serdema komarê li axa

Osmaniyan dijîn, ji têgînên erebî û farisî ne xerîb bûn. Lewma mirov dikare bibêje ku mewlîda Bateyî ya ku tijî peyvên erebî û farisî ye, ji aliyê gel ve bi hêsanî di hat fêmkirin û li derdorê belav bûye û ji bo vê yeke jî hewcedarî bi nivîsandina mewlîdeke din nebûye. Lê bi taybetî piştî reforma alfabeyê li Tirkiyê, ji ber hewlên cudakirina zimanê tirkî ji biwêjên farisî û erebî, ji raya giştî re zehmet bûye ku metnên ku têgehên van her du zimanan tê de hebune. Loma ji ber ku di Mewlîda Bateyî de peyvên erebî û farisî jî hene, pêdiviya nivîsandina mewlîdên ku gel bi hêsanî jê fêm bike derkete holê. Lê helbet sebebê ku piştî Bateyî mewlîd hatine nivîsandin ne ev tenê ye. Sedem çi dibe bila bibe, gelek kes hebûn ku dixwestin hestên xwe yên li hember jidayîkbûna Pêxember (s.a.w.) bînin ziman. Di vî warî de, bi piranî di çaryeka dawî ya sedsala bîstan de, piştî Melayê Bateyî, mewlîdên kurdî bi zaravayên soranî, zazakî û kurmancî dest bi nivîsandinê hat kirin. Lê mewlîda Bateyî di nav kurdan de her tim giraniya xwe parastiye. Li gel vê, mewlîdên ku ji aliyê berbelavbûna xwendinê ve li hin herêman cihê xwe digirin jî hene. Wek mînak mewlîda ku Şêx Mihemed Emîn Heyderî di sala 1975an de bi zaravayê kurmancî nivîsandiye yek ji wan e. Ji mewlîda Bateyî sadetir, zelaltir û kurttir e. Bi van taybetmendiyan mewlîda Heyderî li herêmên ku kurd lê dijîn bi taybetî li bajarên wekî Mêrdîn û Amedê gelekî dihat xwendin (Tıraşçı, 2013: 215). Heta îro ji 60î zêdetir mewlîdên Kurdî hatine nivîsandin. Lê bandora mewlîda Bateyî hem ji aliyê naverok û hem jî ji aliyê şeklê ve hema hema di van hemû mewlîdan de tê dîtin. Ji bo ku mijar dirêj nebe, li şûna ku em hemû mewlîdên Kurdî bidin, hinek ji wan bi nav, nivîskar û zaravayên xwe li jêr hatine rêzkirin: (Akçay, 2013: 398; Ertekin, 2017: 149-155):

> Mewlîda Şêx Huseyn Qazî (Soranî), 2. Mewlîda Mele Ehmedê Xasî (Zazakî), 3. Mewlîda Şêx Mihemed Xal (Soranî), 4. Mewlîda Mamosta Mele ‘Ebdulkerîm el-Muderrîs (Soranî), 5. Mewlîda Şeyh Mihemed Emîn Heyderî (Kürmanci), 6. Mewlîda Seyyid Mihemed İbrahim Heqqî. 7. Mewlîda Mele Nûrîyê Hesarî (Kürmanci), 8. Mewlîda Mele Ehmedê Zinarexî/Hezex/Şirnex (Kürmanci), 9. Mewlîda Seyyid Mihemed Şerîfê Batêrgizî (Kürmanci), 10. Mewlîda Seyyid Feyzullahê Findikî (Kürmanci), 11. Mewlîda Mele Süleyman Kurşun (Kürmanci), 12. Mewlîda Mele Şewqîyê Helexî (Kürmanci), 13. Mewlîda Şêx Feyzûllah Xiznewî (Kürmanci), 14. Mewlîda Mihemed Zahit Kardeşlik (Kürmanci), 15. Mewlîda Mele Mihemedê Ğursî (Kürmanci), 16. Mewlîda Mele Burhan Hedbî (Kürmanci).

1.

**1.2. Naveroka mewlîdên Kurdî**

Armanca mewlîdê a esasî, diyarkirina teşrîf a Pêxember (s.a.w) li dinyayê. Her çiqas ji mewlîdê heta mewlîdê diguhere jî, bi giştî beşên mewlîdê hene ku jê re “behir” tê gotin. Lê beriya destpêkirina mewlîdê beşa basmele û selewatan heye. Ji bo ku di destpêka mewlîdê de piştî besmeleyê bi selewatekê dest pê bike lî gelek ciya ev ayet tê xwendin: ﴿إِنَّ اللهَ وَمَلَٰئِكَتَهُ يُصَلُّونَ عَلَى النَّبِيِّ يَا اَيُّهَا الَّذِينَ اٰمَنُوا صَلُّوا عَلَيْهِ وَسَلِّمُوا تَسْلِيمًا﴾ “*Bi rastî Xweda û melaîketên Wî selewatân li ser pêxember didin. Gelî bawermendan! Win ji selat û selam li ser wî bidin.*”[2]

Mevlîd bi piranî ji van mijaran pêk tê: Pesn û şikir, afirandina ji ronahiyê û afirandina gerdûnê, afirandina Adem û şandina wî ji cennetê ser rûyê erdê, nesla Resûlê Xuda (s.a.v.), wîladeta wî, mûcîzên wî, dayîna wî ji Halîme re ji bo şîr, merhaba, selewat teşrîfa wî li dinyayê, şemâil, îsra û mirac, münacat û dua (Kızıl, 2012: 124-135). Niha, hin mijarên bingehîn û çend nimûne ji mijarên mewlîdên curbecur li jêr têne dayîn:

**Beşa Yekem: Pesn û Şikir**

Hedîsa “*Her karê girîng ku bi pesnê (ji Xwedê re) dest pê nekiriye, ne temam û bê bereket e*" di nivîsên Îslamî de destpêkirin a bi pesindayînê kiriye kevneşopek olî. Ev kevneşopî di mewlîdê de jî heye. Hemd, bi eşq û hurmet mezinkirin û dâyin a pesnê Xwedê ye, lê şikir, pesindan a Xwedê ji bo nimete ku dâyine me (Curcânî, 1985: 98, 133). Di van wateyan de hemd û şikir, beşa yekem a mewlîdê pêk tîne. Di vê beşê de ji bo her cure nîmetan, bi taybetî ol û baweriya ku ji aliyê Xweda ve li bendeyên wî hatiye dayîn, pesn û spasî tê kirin. Di piraniya mewlîdan de mewlîd bi pesindayînê dest pê dike. Li aliyê din Basmele ji xeynî beytê mewlît bi prozê hatiye nivîsandin. Di mewlîdên hin alimên wek Mele Ehmedê Zinarexî û Seyyid Şerîf de bi navê Xweda (besmele) dest pê kiriye. Li jêr beşa hemd û şikir ji hinek mewlîdan hatine dayin:

Mewlîda Bateyî:

حَمْدِ بِي حَدْ بُو خُدَايِ عَالِمِين - أَوْ خُدَايِ دَايَهْ مَهْ دِينِ مُبِين (Bateyî, b.t.: 2)

Mewlîda Heyderî:

أمْ بِدِنْ حَمْدى خُودى أيْ مُسْلِمانْ - دايَمَه پَيْغَمْبَرى آخِرْ زَمانْ (Heyderî, 2015: 17)

Mewlîda Mele Ehmedê Zinarexî:

[2] el-Ehzab 33/56.

بِناقِی أَللهِ أَمْ دِكِنْ اِبْتِداءْ – گو رَحْمانْ رَحِيمَ ژِ بو مَه خُداء

دِپَيْرَ گو حَمْدا دِكِنْ أمْ مُدامْ - ژِ بو خالِقِی گو لْمَه كِرْيه اِنْعامْ (Zinarexî, b.t.: 2a)

Mewlîda Mele Mustafa Êzdârî:

بِی ژِمارْ حَمْدُو ثَنَايِی قَلْبُ و جانْ – أَمْ دِدِنْ بُيْ خالِقِی كَوْنُ مَكانْ (Êzdârî, 2014: 3)

Mewlîda Batêrgizî:

بِناڤِي خُدا أزْ دِكِمْ اِبْتِدا – دِكِمْ حَمْدُو شُكْرِی ژِ بونا خُدا (Batêrgizî, b.t.: 4)

**Beşa Duyem: Selewat**

Beşa Selewat jî wek navberek di navbera beşande tê dîtin. Bi gelemperî ji dubendekê pêk tê û li dawiya her beşê tê danîn. Piştî ku ev beş tê xwendin, ji aliyê guhdarân ve sê caran salat û silav ji Pêxember re tê dayîn. Selewat ji van peyvan pêk tê:

الصَّلاةُ وَالسَّلامُ عَلَيْكَ يا رَسُولَ الله ـ الصَّلاةُ وَالسَّلامُ عَلَيْكَ يا حَبِيبَ الله ـ الصَّلاةُ وَالسَّلامُ عَلَيْكَ يا نَبِيَّ الله.

Selewat wiha jî tê gotin:

صَلاةُ الله سَلامُ الله عَلَيْكَ يا رَسُولَ الله ـ صَلاةُ الله سَلامُ الله عَلَيْكَ يا حَبِيبَ الله ـ صَلاةُ الله سَلامُ الله عَلَيْكَ يا نَبِيَّ الله.

Hin mînakên dubendên ku beşa selewatan pêk tînin li jêr têne dayîn:

Mewlîda Bateyî:

گَرْ دِڤِيتِنْ هُنْ ژناري بِنْ نَجاتْ – بعِشْقُ شوقك هُنْ بِبيژِنْ الصلاة (Bateyî, b.t.: 3)

Mewlîda Heyderî:

هُونْ ژِعِشْقا دِلْ بِبيژِنْ بَرْ دَوامْ - سَرْ مُـحمدْ اَلصَّلاةُ وَالسَّلامْ (Heyderî, 2015: 17)

Mewlîda Mele Suleyman Kurşun:

گَرْ دِڤِنْ وِنْ مَهْدَرَاوِي هَرْ دَوامْ – سَرْ بِخوينِنْ پِرْ صَلاةُ پِرْ سَلامْ :(Kurşun, 2010: 5)

Mewlîda Batêrgizî:

ژِعِشْقا دِلِی خُو گَلِي خاصُو عامْ – بِدِنْ سَرْ مُحَمَّدْ صَلاتو سَلامْ (Batêrgizî, b.t.: 5)

Ji alîyek dî, Mele Mihemedê Xursî ji bo her mijarê forma selewatên cûda pêşkêşî kirîye. Çend mînak li jêr hatine dayîn:

يَكْ صَلاةْ كِی كَسِی كُو بِينَه – دَهْ صَلاةْ خُودِی بِسَرْ تِينَه

اللهُ و مَلَكْ صَلاتِی تِينِنْ – هُنْ ژِي پِرْ بِدِنْ بِرايِی مُؤْمِنْ

دَهْ صَلاةْ بِرَا كَسِی كُو بِينَه – صَدْ صَلاةْ خُودِی بِسَرْ تِينَه

أَوْ كَسِی كُو صَدْ صَلاتِی بِينَه – وِی خُدِی حَزَارْ بِسَرْدَه تِينَه (Xursî, b.t.: 3-10)

**Beşa Sêyem: Xêra Pîrozkirin u Xwendina Mewlîdê**

Di vê beşê de behsa girîngî û xelata pîrozkirina jidayîkbûna Pêxemberê me (as) tê kirin. Di vê beşê de ji ber îfadeyên zêde yên li ser coş û kelecanê, dibe ku rîwayetê qels û mevdu an jî xurafe hebin. Lê ji bo her mewlîdê ev gotin ne rast e. Lewra Şeyx Mihemed Emînê Heyderî di dema saxbûna xwe de van riwayetân ji mewlîda xwe derxistiye. (Akçay, 2013: 398). Her wiha Mele Mihemedê Xursî bi xwe jî di mewlîda xwe de diyar kiriye ku dema mewlîda xwe dinivîsandiye ji van rîwayetan dûr ketiye (Xursî, b.t.: 3).

**Beşa Çarem**: **Xuluqandina Ronahîya Pêxember**

Di vê beşê de tê behskirin ku Xwedê pêşî ronahiyê afirandiye û ev ronahî ronahiya Resûlê Xwedê ye û tê gotin ku gerdûn ji vê ronahiyê hatiye afirandin.

**Beşa Pêncem: Afirandina Âdem Pêxember**

Di vê beşê de afirandina Adem wek xelifê Xwedê li ser ûyê erdê û diyalogên ku di navbera Xwedê, milyaket, şeytan û Adem de têne vegotin tê behskirin.

**Beşa Şeşem: Neseba Pêxember**

Di vê beşê de nesla Pêxemberê me (s.a.w.) tê ser ziman ku bi piranî digihe bavê wî Ednan.

**Beşa Heftem: Dê u Bavê Pêxember**

Di vê beşê de behsa dê û bavê Pêxember (s.a.w.) tê kirin. Piştre behsa planên cihûyan ên kuştina Ebdullah û amadekariya zewaca Ebdullah tê kirin.

**Beşa Heştem: Bihemlbûna Amîne bi Pêxember**

Di vê beşê de behsa ducaniya Amîne ya bi Pêxember û xewnên ku wê di vê pêvajoyê de dîtiye û rewşa ducaniyê tê vegotin.

**Beşa Nehem: Jidayikbûna Pêxember**

Di vê beşê de hatina Pêxemberê me (s.a.w) bo dinyayê tê vegotin. Ji xeynî vê jî nîşanên ku Ebdulmutelip u Amîne dîtine u bûyerên ku di şeva çêbûna Pêxember de qewimîne têne behskirin.

**Beşa Dehem: Merheba**

Yek ji girîngtirîn mijarên mewlîdê tê dîtin. Di vê beşê de coş û hezkirina hatina Pêxemberê me (s.a.w) bo dinyayê tê vegotin. Dema mirov vê mijarê dixwîne li hin cihan ji ber hurmeta Pêxember radibe ser piyan. Herçiqasî ne adet e ku li hin cihan rabin piya jî, bi kêmanî yek radibe û li ser çokan rûdine. Li jêr çend nimûne ji beşa merheba ji hin mewlîdên hatine dayin:

Mewlîda Bateyî:

جمله ذرات جهان دا أڤ ندا - كرنه گازى پيكڤه گوتن مرحبا

مرحبا أى سرّ فرقان مرحبا - مرحبا أى درمان دردان مرحبا (Bateyî, b.t.: 24)

Mewlîda Heyderî:

هات ﷴ مرحبا صد مرحبا - هات ﷴ بو شفيعى مذنبا (Heyderî, 2015: 25-26)

Mewlîda Zinarexî:

آفَرِينْ صَدْ آفَرِينْ هَرْ ژِ تَرا – اَڤْ دِينِى حَقْ گُو تَه آنِي ژِ مَرا (Zinarexî, b.t.: 10b)

**Beşa Yazdehem: Paşgotin u Dua**

Di vê beşêde ku beşa dawî ya mewlîdê ye, ji bo nivîskar bi taybetî ji Pêxember, malbata wî û hevalên wî, ji hemû bawermendan û ji civata hazir re dua tê kirin. Di hin mewlîdan de nivîskar, rasterast an jî nerasterast navê xwe tîne ziman û ji bo xwe û pêxemberê me û hemû ummeta wî ji guhdar û xwendevanên hazir Fatîha dixwaze. Ev rewş dikare di mînakên jêrîn de were dîtin:

Mewlîda Bateyî:

هَمْ ژِبُو هَرْ چَارْ إمامِ جادَهءِ – هَمْ ژِبُونا كاتِبِ ڤِى نُسْخَهءِ

بُو جَمِيعِ مُسْلِمِينْ و صالِحه – بُو فَقِيرِ باتَيِى الفاتِحَه (Bateyî, b.t.: 45)

Mewlîda Heyderî:

اِى گُو تَأْليفْ كِرْيَه مَوْلُودْ أَيْ بِرا - بُو فَقيرى حَيْدَري هَمْ حاضِرا

هُونْ بِخوينِنْ فاتحَه سَرْڤانْ تَمام - سَرْ مُحمدْ اَلصَّلاةُ وَالسَّلامْ (Heyderî, 2015: 27)

Mewlîda Mustafa Êzdârî:

سَرْ نِڤِيسْكَرِىِ ڤِى مَوْلِداَ شَرِيفْ – مُصْطَفَى پِى ژَارُو بِيزَارُو زَعِيفْ

سَرْ تَمَامِى رُوحِى قَنْجُ و صَالِحا – أَمْ بِخونِنْ سُورَتِى اَلْفاتِحَه (Êzdârî, 2014: 30)

Mewlîda Sîraceddîn Xelîlî:

بُو سِراجُ و حاضِرُ و هَمْ صالِحا – كُو تَمامْبُو هُنْ بِخوينِنْ فاتِحَه (Xelîlî, 2009: 26)

### 1.3. Di Perspektîfa Wêjeyî de Mewlîdên Kurdî

Mewlîdên kurdî yên naskirî tev bi nezm in û piraniya wan di nezm u vezna fâʻilatun/fâʻilatun/fâʻilun de ne. Di mewlîdê de mînakên hunerên edebî yên dewlemend ên wek teşbîh, îstîare kînaye, cinas, iktibas, tibâkê hene. Ev nîşan dide ku mewlîd di warê edebî de kedek mezin dide ziman. Nimûneyên girîng ên her hunereke edebî ji mewlîdên curbecur li jêr têne pêşkêş kirin:

#### 1.3.1. Teşbîh

Teşbîh wek hunereke edebî, ew e ku ji ber pêwendîdariyekê berawirdkirina hâmanên qels bi hâmanên xurt re bikin ji bona ku wateyê xurt bikin (et-Teftâzânî, 2013: 516-520). Berawirdkirina Pêxemberê me bi roj, hîv û gulê re di bedewbûnê de yek ji mînakên hevpar ên mewlîdê ye. Wek mînak, Melayê Bateyî, Resûlê Xuda berawird kiriye bi rojê di şewqa wî ya di ronahiyê de, û bi heyvê di ronî û bedewîya wî de di van dubendan de:

مَرْحَبَا أَيْ شَمْسِى تابانْ مَرْحَبَا – مَرْحَبَا أَيْ جانِى جانانْ مَرْحَبَا

مَرْحَبَا أَيْ آفِتابِى بِى زَوالْ - مَرْحَبَا أَيْ ماهِى تَابِى لا يَزَالْ

مَرْحَبَا أَيْ نُورِى خُورْشيدِى خُدَا - مَرْحَبَا أَيْ تُو ژِحَقْ نا بِى جُدَا (Bateyî, b.t.: 24)

Li vir nivîskar bedewiya Pêxember û ronahiya wî ya ku dinyayê ronî dike, dişibîne ronahiya roj û heyvê. Di dubenda yekem de peyva شمس bi wateya roj ji bo Pêxemberê me hatiye bikaranîn, di dubenda duyem de jî آفِتاب bi maneya rû-roj û ماهِتاب bi maneya rûheyv hatiye bikaranîn. Di dubenda sêyem de ronahiya wî dişibîne ronahiya rojê (خورْشيد).

Di gelek mewlîdan de yek ji wan teşbîhên ku tê kirin ew e ku şerbeta ku berî zayînê ji dayîka Pêxember Amine re tê pêşkêşkirin, ji bo tîbûna xwe têr bike, dişibin sermaya berfê û tama hingiv. Mihemed İbrahim Heqqî jî di mewlîda xwe de ev teşbih kiriye:

دَوْ ظُوَاوُ تِهْنِى بُومْ وِى ساعَتِى – مِنْ دِي آنِينْ قَدَحَكْ ژِ شَرْبَتِى

وَكِي بَرْفِى سارَه شِرِينْ وَكْ عَسَلْ – هَمْ سِپِيتِرْ أَو ژِ شِيرْ كُو أَوْ سِپِيدَه بُو مَثَلْ (Heqqî, b.t.: 25)

#### 1.3.2. Îstîare

Yek ji hêmanên wêjeyî yên ku di gelek mewlîdan de cih digire metafore. Îstîare, hunera bikaranîna peyvekê li şûna peyveke din bi armanca şibandinê ye bê bikaranîna yek ji aliyên

teşbîhê (et-Teftâzânî, 2013: 578-584). Di beşa silava Mewlîda Bateyî de em dikarin gelek mînakên istiarê bibînin. Lewra di van dubendiyên jêrîn de qabiliyeta axaftinê ji hemû heyînên gerdûnê re hatiye destnîşankirin û tiştên ku hêza wan a axaftinê nîne bi mirovan re têne berawirdkirin û hunera întaqê tê bikaranîn:

جُمْلَه زَرَّاتِی جِهانْدا أَڤْ نِدا – كِرْنَه گازِي پِيكْڤَه گوتِنْ مَرْحَبا (Bateyî, b.t.: 24)

Ev dubendiya Şêx Mihemed Emîn Heyderî yek ji mînakên baş ên istiarê ye:

صُورْ گُلِی باغَا ژِ وَجْهِی تَه فَدِي – وَكْ تَه شِرِينُ و خوشِكْ كَسْكِي نَدِي (Heyderî, 2015: 26)

Li vir nivîskar bi gotina "gulên sor ên li bexçân ji rûyê te hesûd in û şerm dikin" bal kişandiye ser bedewiya Pêxember. Di dubendê de taybetiya mirovî ya şermê (فَدِي) wek gula sor (صُورْ گُلِی) hatiye binavkirin.

#### 1.3.3. Kînaye

Kînaye, bikaranîna peyvekê yan hevokekê li derveyî wateya wê ya wêjeyî, ne bi qesda teşbîhê û bê qerînek ku asteng bikê wateya rastîn (el-Hâşimî, b.t.: 286-290). Em dikarin mînakên vê hunerê jî di mewlîdân de bibînin. Mesela, di dubendiya jêrîn a Bateyî de mînaka kİnayê heye:

حَسْرَتُو كَرْبِی هَمِي بَرْبادْ كِرِنْ – وِ شَقِی صَدْ ژِنْ تَمامِی ژِی مِرِنْ (Bateyî, b.t.: 18)

Li vir helbestvan dibêje, piştî xebera zewaca Ebdullah û Amîneyê, sed jin li Mekkê mirine, ji ber ku nikarin bi Abdullah re bizewicin. Her çendî qerîneyek ku rê li ber wateya rast bigire tune ye, lê bi rastî jî xwestiye ku xwestinê keçan bi Abdullah re bênê ser ziman.

Mele Mustefa Êzdari jî di dubendiya jêrîn de xwestiye ku beje Ebdullah wefat kiriye, lê gotiye ku ew ji Yesribê (Medîne) venegerîyaye:

ما لِه يَثْرِبِی مَكانِي هِجْرِتِی – ما لِه يَثْرِبِی دِيارِی فِرْقَتِی (Êzdârî, 2014: 22)

#### 1.3.4. Cînas

Cînas, hunera bi kar anîna peyvên ku bi heman dengî lê xwedî wateyên cuda ne bi hev re. Cînas a temam û netemam heye. Cînas a temam, ku peyva tije ji bo du peyvên bi heman tîp, hejmar, rêzik û tevgera tê bikaranîn, dema ku yek ji wan tune be, cinas a netemam tê bikaranîn (el-Hâşimî, b.t.: 325-327). Di mewlîda Seyyîd Şerîf Batêrgizî de ev mînakên jêrîn mînakên baş ên cînas a temame:

قَلَمْ طِرْسِيَا بُو ژْ حَياءَ **خُدا** – أَلَمْ گِرْتِي بُو شَقْ دِناڤا **خُدَا** (Batêrgizî, b.t.: 8)

Li vir, di navbera bêjeyên خُدا yên li dawiya her du şatran de cinas a temam heye. Her wiha di mewlîda Mele Silêman Kurşun de jî di dubendiya jêrîn de di navbera bêjeyên «خُدا» de mînak a cinas a temam heye:

وِي دِ هَرْ حالُ و دِ هَرْ حالِى **خُدا** – هَرْ بِلاو تِيم خو دَعْوَتا **خُدا** (Kurşun, 2010: 38)

### 1.3.5. Tîbak

Tîbak di hevokê de bikaranîna antonîm an jî peyvên erênî-neyînî ye (et-Teftâzânî, 2013: 641). Ev ne tenê ahengekê li helbestê zêde dike, di heman demê de wateyê jî bi bandor û xweş dike. Wekî din, pir caran, têgehek dema ku bi hev re bi dijberiya xwe re tê gotin hêsantir tê fêm kirin. Yek ji hunerên edebî yên ku di mewlîdên kurdî de tê dîtin, tibâk e. Mînak di van dubendiyên Mele Mustefayê Êzdârî de hunera tibakê heye:

پِشْتِي وِى **خوشْيُ** و **رَحَتْيا** جَنَّتِى – أوْ لِه دُنْيِى كَتْنَه **تَعْدَ** وْ **أزْيَتِى**

**گَرْمُ** و **هاڤِينْ** هَمْ **زِڤِسْتَانُ** و **سَقَمْ** – بِرْچِيبُونْ تِيبُونْ نَخوشِيُ و أَلَمْ (Êzdârî, 2014, 13)

Bi rastî di virde peyva خوشْيُ و رَحَتِي di wateya rehetiyê de û تَعْدَ وْ أزْيَت di wateya tengasî û ezab de bi hev re hatine bikaranîn. Dîsa di wateyên havîn, zivistan, germî û sermayê de peyvên dijber jî bi hev re di dubendekê de hatine bikaranîn.

Hunera tibakê di dubendên Heyderî yên jêrîn de jî heye. Ji ber ku peyvên berevajî yên bi maneya çûn û hatin û hişk û şil bi hev re têne bikar anîn:

**چُو** ژْ عَبْدُ المُطَّلِبْ نُورا هِمَامْ – **هاتْ** ژْ عَبْدُ اللهْ رَه بُو پِشْتَكْ تَمَامْ

دَارَا **هِشْكْ** رُونِمْ لِبِنْ أَوْ **شِينْ** دِبِى – گُو ژِبِنْ چُومْ وَكْ بَرِى دارْ هِشْكْ دِبِى

يَكْ **لِرَاسْتْ** يَكْ **لِچَپْ** هاتْ يَكْ **لِپِشْتْ** – مَرْيَمَا عُمْرَانِي هاتْ **بَرْمِنْ** رُونِشْتْ

نُورْ ژِمِنْ دَرْكَتْ بِبَرْ آسْمانا **چُو** – دِيسَه **هاتِي** سَرْ مِرَ وَكْ عَوْرِى نُو (Heyderî, 2015: 20, 21, 24)

Dîsa di dubendiyên Heyderî yên li jêr de, bikaranîna antonîmên wek rast-çep, çûn-hatin bi hev re ji bo tibakê mînakeke baş e:

**چُونْ** و **هاتِنْ** **رَاسْتْ** و **چَپْ** طَيْرِى بَلَكْ – أَزْ دِوي حالِيدَه تِي بَومَه گَلَكْ (Heyderî, 2015: 25)

## 2. Merasîmên Mewlîdê di nav Kurdên Tirkiyê de

Xwendina mewlîdê li nav hemû gelên ku li Tirkiyeyê dijîn hevpar e. Ji ber vê yekê ev adet di nav kurdên Tirkiyê de jî hevpar e. Mewlîd her çend wekî kevneşopiyek olî tê zanîn jî, aliyên wê yên ku bi aliyên civakî, çandî û edebî ve girêdayî ne, hene. Bi rastî jî mewlîd, pêşî di rojbûna Pêxemberê me de û pıştre di hemû kêliyên şahî û xemgîniyê de, wek dawet, mezûnbûn, kar, sinet,

sersaxiyê, tê xwendin û pîrozkirin. Bi ser de jî, carinan dikare bi mebesta ku tenê çend kesan li ser masekê kom bike û mêvanan bike, tê xwendin. Ev yek nîşan dide ku kurdan hema hema di her bûyereke girîng de şahiya ji dayîkbûna Pêxemberê me parve kirine. Kevneşopiya Cejna Mewlîdê ku bi berfirehî û bi tundî di jiyana me de cih digire, xwedî bandorek mezin a civakî û çandî ye. Piştî ku li jor behsa aliyê edebî kir, niha em dixwazin li ser tevkariya civakî û çandî ya van merasiman biaxivin.

### 2.1. Sedemên Xwendina Mewlîdê

Mewlîd di eslê xwe de bûyerek e ku li hemû deverên ku şahî û xem lê tê parvekirin belav dibe û ji bo pîrozkirina salvegera jidayikbûna Pêxemberê me (s.a.w) tê xwendin. Xwendina mewlîdê li Tirkiyê hema hema li her deverê û li her civakê dişibin hev. Dibe ku armancên dayîna mewlîdê di van komên jêrîn de werin berhev kirin: (bnr  Efe, 2009: 15-18; Öztürk, 2018: 86-87):

1. Di Roj û Şevên Dînî de

Bi taybetî di qendîl a mewlîdê de û qendîl a Regaîbê, şeva mîracê, şeva Beratê, şeva Qedrê, şevên Remezanê, meha Remezanê û cejna qurbanê da mewlîd tê dayîn. Mewlîd ji bilî meha Remezanê di roj û şevên din ên girîng de hem bi roj hem jî êvarê dikare were dayîn.

2. Roja Sêyemîn a Sersaxiyê

Bi gelemperî danê nîvro tê dayîn û dawiya sersaxiyê nîşan dide. Her çend ev mewlîd, ku nîşana cejna hatina Pêxemberê me (s.a.a.) ye bo cîhanê, nakokiyek e, lê tê bawer kirin ku ev mewlîd di kêliyên xemgîniyê de hêmanek teseliyê ye wek sersaxiyê û tê bawerkirin ku bi duayên wek zikr, selewat û nimêjê xelat ji miriyan re tê dayîn.

3. Li ser Salvegerên Jidayîkbûn û Mirinê

Her çend ne adeteke hevpar e ku di pîrozbahiyên rojbûna zarokan de mewlîd were xwendin, lê tê dîtin ku hin malbatên hestiyar ji aliyê olî ve wekî alternatîfa pîrozbahiyên rojavayî mewlîd xwendine. Her çend ne gelemperî be jî, tê dîtin ku bi taybetî di salvegera mirina rêberên olî û ramanî de mewlîd tên dayîn.

4. Merasimên Soz, Nîşan û Dawet û Sinet:

Herçiqas di merasimên soz û dawet û sinetê de ne zêde be jî, di dawetan de mewlîd tê xwendin. Di hin dawetan de ji ber ku reqsa jin û mêran bihevre guneh tê dîtin û ji bo ku ji şahiyên bi dîlan û muzîkê dûrkevin, tenê mewlîd tê xwendin. Lê dawetên ku jin û mêr li cihên cuda dîlanê

û kêf û şahiyê dikin jî pir in, û di van dawetan de mewlîd tên xwendin. Bi rastî di nav Kurdên Tirkiyê de adeteke hevpar e ku di her dawetekê de, bi çi rengî be, mewlîd bê dayîn.

5. Di Nezr û Sondande:

Di nezrû u sondên ku mirov dide di dema peydabûna karekî xwestî de, wek serketina îmtîhanekê, ketina karekî, saxbûn u xilasbûna ji nexweşî yan pirsgirêkekê, çêbuna zarokeki, tayînkirina li cihê xwestî, terfî kirin, girtina dîplomekê yan belgekê, xwedîbuna mal an jî erebekê de jî mewlîd tê dayîn. Mesela dibêjê "*Ger felan felan işê mi were serî ezê mewlîdkê bidim.*"

6. Di Merasîmên Avakirinê û Vekirinê û Danînâ Bigehânde:

Mewlîd bi nîyeta bereketê tê dayin di danîna temel û bingehânde an vekirina saziyeke olî de wek mizgeft û qursa Qur'anê û medrese an jî kargeheke bazirganiyê ya wek dikan û febrîqe û kargehan de.

7. Di vegera ji sefereke girîng wek umre û hec û leşkerîyê de.

8. Her wiha mewlîd tê dayin jî bo destpêka medreseyê û mezûnbûna wê de û dema destpêkirina xwendina Quranê û temamkirina/xetimkirina wê.

9. Di dema nimêja baranê de jî xwarin û mewlîd tê dayîn.

10. Mewlîd dîsa tê dayin ji bo ku xizm, cîran, dost û eqrebayên li ser sifreyekê tên cem hev tê dayîn. Bi rasti li gundan ev bûyereke hevpar e.

### 2.2. Amadekariyên Mewlîdê

Amadekariya ewil a mewlîdê, diyarkirina ku kî were mewlîde û hejmara mêvanên ku werin. Carna xwarinek li gorî hejmara mêvanan tê amadekirin, carna jî pêşî xwarin tê amadekirin û piştre li gorî mêjera xwarinê hejmara mêvanan tê diyarkirin.

#### 2.2.1. Vexwendinâ Mewlîdê

Vexwendina mewlîdê, li gor cih û çînu derecê mêvanan bi gelek awayan tên kirin. Mesela carna zarokan dişînin vexwendinê, carna jî bi telefonê tê vexwendin. Û carna li cihên ku civak lê ye, wek mizgeft, qehwexane, komele, bi awayekî kolektîf bi anonsê tê kirin. Her wiha dibe ku xwediyê mewlîdê bi xwe serdana malan bike û wan vexwîne mewlîdê. Mêvan li gor sedem û niyet û çarçoveya mewlîdê diguhere. Li gorî vê yekê, mêvan dikarin tenê endamên malbatê jî bin, an jî heval, xizm, cîran, hemî gundî an hemî mêvanên ku ji ber her sedemê amade bin. Li cihên biçûk ên wek gund, qeseba, bajarok, melayê gund, mamosteyê gund an jî memûrên ku timî li

gund in tim di nava mêvanan de ne. Li belê ê ku her tim tên vexwendin, yetîm û belengazın (Akkoyun, Dîroka Hevpeyvînê: 18 Kanûn 2022)

Pankart, broşur, bîlbord, ragihandinên fermî, televizyon û kanalên din ên weşanê û amûrên medyaya civakî ji bo merasîmên mewlîdê yên bi beşdariyeke zêde wek rêbazên vexwendinê tên bikaranîn.

### 2.2.2. Cih, Xwarin û İkram

Cihê ku dê mewlîd were xwendin cihê herî xweş e ku ji bo merasîma mewlîdê hatiye destnîşankirin û temaşevan dikarin serdest bin. Ji ber vê yekê cihê mewlîdê bi baldarî tê hilbijartin. Mesela, cihê xwendina mewlîdê di jûreyên xaniyan de li goşeyê herî xweş e, li mizgeftan jî li ber mihrabê ye. Di salon û meydanan de cihê xwendina mewlîda qonax û platformên bilind in. Kesê ku mewlîdê dide dixwaze ku mewlîd zêdetir li mala wî bê xwendin. Ji ber ku tê bawer kirin ku cihê mewlîd tê de tê xwendin, dê milyaket û bereket bikevin wî cihî, û bi saya selewatên ku di mewlîdê de têne xwendin dê cîh ji çavê xerab û tengasiyê dûr be û tê bawer kirin ku bersivên pirsên milyaketên di gorê de wê hêsantir bibin. Ev bawerî, li ser rîwayetên ku di hin mewlîdan de derbâsdibê. Mînak, di Mewlîda Bateyî de van rîwayetan hene:

هَرْ جِهِی لِی بِتَه خونْدِنْ رَحْمَه لِی – دِی مَلَكْ بِبِنْ تِژِي وِی مَنْزِلِی

خَانِیِی لِی بِتَه خونْدِنْ أَقْ صَلاه – دِی بِبِتَه باعِثِی دَفْعَا بَلا

دَافِعِی جُمْلَه حَسُودِی چَاقْ خَرابْ – دَرْ مَزارِی سَهْلَ لِی رَدًّا جَوَابْ (Bateyî, b.t.: 5)

Di mewlîda Heyderî de jî ku berê bi vî rengî vegotinên hebûn, lê piştî ku hat fahmkirin ku ev rîwayet lawaz in an jî ne rastin in, ji aliyê nivîskarê wê ve ji mewlîdê hat derxistin.

Ji bo ku cihên mewlîdê paqij û bîhnxweş bin, xwedyê mewlîdê û kesên ku diçin mewlîdê ehmmiyetê didin ku cil û bergên xwe yên paqij li xwe bikin û bêhneke xweş li xwedin. Ji ber vê sedemê li hin cihan di oda ku mewlîd tê xwendin de bêhnên xweş ên wek misk, bixûr û ava gulê tê hiştin.

Di merasîmên mewlîdê de adetî ye ku ji gûhdaran û mêvanan re xêrek bê pêşkêşkirin. Bi rastî di hin mewlîdan de tê bawer kirin ku divê tiştek were pêşkêş kirin, ji ber ku tê gotin dê ji bo vê yekê xelat hebe. Di Mewlîda Bateyî de ev dubendî balê dikişînin ser vê mijarê:

هَرْكَسِی حاضِرْ بِكَه أَوْ يَكْ طَعامْ – با بُخُورُ و شَرْبَتُ و قَدْرَكْ تَمامْ

تِبتَه حَشْرِی أَوْ دِگَلْ خَلْقِی بَرِی – يَعْنِي با پَيْغَمْبَرانِی أَنْوَرِی

هَرْچِ بِبنِتْ هِنْدِ تِشْتِی خوارِنِی – دِی مُبارَكْ بِتْ لِبَرْ ڨِی خونْدِنِی (Bateyî, b.t.: 5)

Hebûna ayetên ku işaretî bi ikrama mêvanan dikin û hedîsên ku vê meselê teşwîq dikin, kirîye âdet ku di nav civakên Misilmanan de di merasîmên mewlîdê de bi xwarin û tiştên din ikram bê kirin.[3] Bi rastî, gava ku meriv qala mewlîdê dike, yekem tiştê ku tê bîra me xwarin an jî ikramin. Ji ber vê yekê mewlîd û xwarin du têgînên ku hema hema wek hev in.

Îkramên diyariyên ku di mewlîdê de têne kirin, li gorî armanca pêşkêşkirinê, çand û edetên mirovên li wir û herêm û bajaran diguhere. Hêmana xwarinê ya serdest a li herêmê jî hêmana xwarina mewlîdê ye. Ev bi gelemperî ji xwarinên sereke yên goşt pêk tê. Mînak li Mêrdînê û derdora wê xwarinên wekî Hemîs, Bûrgül û goşt, Birinc û goşt, Teşt tên dayîn, li herêmên Ruha û Semsurê jî piranî goşt u birinc û tirşik e û carna xwarinên wek lahmacun, söğürme û kebaba balîcana jî tê dayin (Akçay, A., Dîroka Hevpeyvînê: 20 Kanûn 2022; Koparal, M., Dîroka Hevpeyvînê: 22 Çile 2023; Akçay, Ö., Dîroka Hevpeyvînê: 22 Çile 2023). Li Mêrdînê nanên bi navê “kulîçe”, “çörekên Suryanî” an jî “nanê şêrîn” jî heye ku bi taybetî di mewlîdan de tên belakirin (Öztürk, 2018, r. 88; Bala, Dîroka Hevpeyvînê: 22 Çile 2023). Li Sêrtê her çendî ji bo girseya gel xwarineke zehmet be jî, carna dolme tên dayîn. Dîsa li Sêrtê bal tê kişandin ku nanê ku li kêleka xwarinên mewlîdê tê belakirin, nane bi kûncî ye (Akçay, Ö., Dîroka Hevpeyvînê: 23 Çile 2023). Li der dora Diyarbekir, Elezîz û Bîngolê xwarinên bi qelyê u biraşti derdikevin pêş. Goşt û birinc li derdorên Wan, Colemêrg û Şirnexê yek ji xwarinên mewlîda ewil e. (Aslan, Dîroka Hevpeyvînê: 10.08.2023; Akkoyun, Dîroka Hevpeyvînê: 18 Kanûn 2022).

Xwarinên mewlît bi piranî xwarinên goşt in, lê carinan xwarinên wek şêranî, piskewît, leqûm û kek jî hene. Ji ber vê yeke, li hinek cihan navên wek “Mewlîda goşt”, “Mewlîda nân”, “Mewlîda piskewît u leqûma” jî di nav gel de hene. Di mewlîdên ku li mizgeftan bi taybetî di rojên dînî û şevên mübarek de tên dayîn û ne ji kesekî diyar re, bi gelemperî şîranî, kek, pîskewît û leqûm, gufret û meşrûbat têne dayîn. Lê mewlîdên ku kesekî taybet dide bi piranî ji xwarinên sereke yên bi goşt pêk tê. Her çend vexwarina ku li kêleka xwarinê tê pêşkêş kirin bi piranî dew e, vexwarinên cûrbecûr yên wekî lîmonad, ava fêkiyan û cola jî tên pêşkêş kirin. Carinan çay an jî li hin herêman qehweya mîrayê tê dayîn. Lê bi gelemperî çay ji bo mêvanên ku piştî bidawîbûna merasima mewlîdê dimînin û rûnin tê serwîs kirin (Tekîn, Dîroka hevpeyvînê: 20.12.2022; Salihoglu, Dîroka hevpeyvînê: 10.12.2022; Hamzaoğlu, Dîroka hevpeyvînê:

[3] Ji bo ayetê binerin ez-Zariyat, 51/24-27. Ji bo hedîsan binerin Buxarî, Nîkah 80, Edeb 31, 85, Rîqaq 23; Muslîm, Îman 74, 75, 77; Ebu Davud, Edeb 123; Tîrmîzî, Qiyamet 50; Îbnî Mace, Edeb 4.

22.01.2023; ; Öztürk, 2018, 87-88). Li herêma Wanê di dema mewlîdê de ava bi şekir wek kevneşopiyeke kevn tê dayîn. Lê ev ne vexwarina bi xwarinê ye, li kêleka xwarinên bi navê *teberrûk* tê danîn û di dawiya mewlîdê de tê îkram kirin. (Çelik, Dîroka Hevpeyvînê: 20 Hezîran 2017; Aslan, Dîroka Hevpeyvînê: 10.08.2023; Temel, Dîroka Hevpeyvînê: 10 Tebax 2023).

**2.3. Xwendina Mewlîdê**

Kesê ku mewlîdê dixwîne bi piranî îmam e. Ger di merasîmê de îmamek hebe, bi gelemperî heta dawiyê ew dixwîne. heger îmam, seydayek bi feqiyên xwe re bê, ji bo teberikê pêşî ew dest bi mewlîdê dike, piştre feqi di domînin. Di beşa silav û duâyê de dîsa seyda di xwîne û bi seyda mewlîd diqede. Li hinek deveran jî mewlîdvan hene ku bi taybetî bi deng û meqamên xwe navdar in, ew tên davetirin di merasîmên mewlîdê de. Lê ev adet li gorî Tirkan di nav Kurdan de ne zêde ye. Di van demên dawî de û îro jî tê dîtin ku mewlîd ji hêla organên weşana dengî yên wekî kaset player, CD player, video player û televîzyonan ve têne guhdarîkirin/lêxistin.

Dema ku mewlîdvan cihê xwe digre, li ser tepsiyek an jî li ser sifreya qumaşê de hinek xwarinên cûrbecûr ên bi navê "teberruk" tên danîn. Bi giştî xwarinên wek bulgur, şekir, birinc, nîsk, xwê, gofrêt, piskewît, lequm û her weha vexwarinên wek şerbet, ava fêkiyan û dew in. Ji xeynê vê, carna pere û berîkên ku di nav wan de pere hene li ser vê tepsiyê têne danîn. Dibê ku ev hemû, ji bo ku bala civatê nekşênê bi paçe ki tê tê nixumandin. Tê bawerkirin ku ev tişt, dê bi mewlîda ku tê xwendin bên pîrozkirin. Dema xwendina mewlîdê di qedê, ev xwarin û şerbetan tên ikram kirin ji kesên amade re, û ew jî ji her yekê hindik tam dikin. Berhemên mayî tê vala kirin cihên xwe. Bi vî awayî tê encamdan ku hemû xwarin bi bereket dibe (Deniz, Dîroka Hevpeyvînê: 13.01.2023; Tarhan, Dîroka Hevpeyvînê: 11 Çile 2023).

Mewlîd bi xwendina sureyek kurt dest pê dike. Piştî ku selewatek ji tê dayin dest bi xwendina mewlîdê tê kirin. Dema mewlîd tê xwendin, civata hazir bi baldarî li mewlîdê guhdarî dike û dema ku navê Pêxemberê me tê gotin, selewatan didê. Lê dema ku fesla selewatan tê, hemû bi hev re bi dengekî bilind sê selewatan didin. Ev jî heyecaneke xweş di haziran de tênê meydanê. Bi taybetî zarok li bendê ne ku beşdarî vê beşê bibin. Kesê ku mewlîdê dixwîne, li gorî rewşa cemaetê, carna li hin cihên mewlîdê de di derbarê jiyana Pêxemberê me, malbata wî an jî pêxemberên din de û an jî an jî dubenda kut ê xwendin rave bi kurtî agahî dide.

Dema xwendina mewlîdê ji nîv saetê heya saetekê diguhere. Ji bo ku xwarina hazir sar nebe yan jî li gor hin rewşên din ên ji nişka ve çêdibin, tê lez kirin di xwendina mewlîdê de an jî bi kurtkirina hin beşan tê xwendin. Carna jî, ji ber karê lezgîn yê mêvan an jî mazûvan, xwarin zu tê xwarin û paşê di wextekî minasib de mewlîd tê xwendin.

Dema mewlîdê dema firavîn an şîvê ye. Lê kêm caran di di dema taştê de u di Remezanê de di dema sehûrê de mewlîd tê dayîn. Her wiha tê dîtin ku di nava rojê de li gundekî ji mewlîdekê zêdetir tê dayîn. Ji ber ku adetên dayîna mewlîdên hevpar di nav Kurdên Tirkiyê de zêde tine ye her malbatek dixwaze mewlîda xwe cuda bide (Tekin, Dîroka Hevpeyvînê: 20 Kanûn 2022).

**2.4. Dawiya Merasîma Mewlîdê û Piştî Mewlîdê**

Piştî ku xwarin tê xwarin, ji aliyê mela ve dûa xwarinê tê xwendin û bi vî awayî mêvan dest bi derketinê dikin. Ji ber vê yekê xwarina xwarinê nîşan dide ku merasima mewlîdê bi dawî bûye. Ji bo ragihandina dawiya merasîmê ne hewce ye ku daxuyaniyek cuda were dayîn. Her yek ji xwediyê mewlîdê re dua dike û derdikeve. Piştî ku qelebalix bela dibe, ji hinek heval û cîranên ku ji bo sohbetê dimînin çay tê pêşkêş kirin. Li hin ciyan piştî ku mêvan bela dibin, zarok tên gazîkirin ser sifrê. Li hinek ciyan ji zarokan re sifreyek cuda tê danîn. Lêbelê, îro, zarok bi gelemperî di nav mêvanan de têne mêvan kirin. Di mewlîdê de sifra jinan, ji ciyê mêran cuda tê danîn. Di gel vê yeke, mewlîdên ku tenê jin an jî tenê mêr tê de beşdar dibin hene. Di mewlîdên ku tenê jin tê de beşdar dibin de jî e ku mewlîdê dixwîne jin e (Akçay, A., Dîroka Hevpeyvînê: 20 Kanûn 2022)

**3. Di nav Kurdên Tirkiyê de Mewlîdên Ku bi Piranî têne Xwendin**

Zehmet e ku meriv agahdariya rast bide ji ber ku li ser vê mijarê li ser bingeha statîstîk an lêkolînek meydanî ya mezin diyar tune. Lê belê agahiyên ku ji aliyê kesên çavkanî yên ku bi salan li herêmên cuda merasîmên mewlîdê xwendine yan jî şahidî kirine û nêrînên nivîskar ku bi xwe beşdarî pîrozbahiyên mewlîdê yên li bajarên curbecur bûne, dikarin agahiyên giştî li ser kîjan mewlîd li kîjan herêmê bêhtir tê tercîhkirin bidin. Lê belê mirov dikare bibêje ku Mewlîda Bateyî li herêmê weke her car li pêş e. Mewlîda Şêx Mihemed Emîn Heyderî piştî mewlîda Bateyî ji aliyê zimanekî xweş û têgihîştî ve yek ji mewlîdên ku herî zêde li Rojhilat û Başûrê Rojhilat bi taybetî li Amed û Mêrdînê tê xwendin. (Öztürk, 2018: 83-84; Tıraşçı, 2013: 215-216).

Mewlîdên Mihemed Zahid Kardeşlik û Mele Suleyman Kurşun û Mele Mustafa Êzdârî û di nav Zazayan jî mewlîda Ehmedê Xasi jî mewlîdên ku li hin herêman tên tercîhkirin û xwendin in. Ji bilî vê mewlîda ku kesê mewlîdê dixwîne an jî yê mewlîdê dide tercîh dike jî girîng e.

**4. Fonksiyona Civakî ya Merasîmên Mewlîdê**

Di dema xwendina mewlîdê de hebûna civakekê di her kêliyê de nîşan dide ku mewlîd xwediyê aliyekî civakî ye. Ji ber vê yekê mewlîd di hemû kêliyên xemgînî û şahiyê de xizm, cîran, heval û hogir, feqîr û dewlemend, zarok û mezinan digihîne hev û ji bo vejandina hestên hevgirtin û parvekirinê di nav mirovan de dibe alîkar. Ji ber ku kombûna li vir bi armanca pîrozkirina hatina Pêxemberê me ya cîhanê ye, di çavên bawermendan de coşa civakî û şahiya yekbûnê zêde dike. Parvekirina jidayikbûna Pêxemberê me di bûyerên wiha berfereh de, ji bo nîşandana nirxê ku civak dide mewlîdê girîng e. Ji ber ku kurên ku di Qendîl a Mewlîdê an jî di meha Rebiulevvelê de çêdibin navê wan datînin "Mewlîd" û navê keçan jî "Mewlîda", nîşan dide ku civak girîngiyeke mezin dide mewlîdê. (Efe, 2019: 19). Ev hemû xal diyar dikin ku mewlîd ji bilî aliyê olî xwedî fonksiyoneke civakî ya xurt e. Her wiha, ji bo yekitî û hevgirtina civakî, lazime ku neye qebulkirin ku mewlîd esasekî olîye û lazime dûrketina ji xurafeyan û tevgerên nexwestî di nav gel de.

**Encam**

Her çiqas li ser mijarên wekî biryarnameya wê ya olî, pîrozbahiya wê ya dîrokî û awayê cejnê tê axaftin jî, piştî heyamekê hema hema li hemû coxrafya Misilmanan bi coşeke mezin hatîye pîrozkirin û pîrozkirin berdewam dike. Merasimên mewlîdê li Tirkiyeyê jî hem ji aliyê Serokatiya Karên Diyanetê ku wekî saziyeke fermî ya dewletê ye û hem ji aliyê gel bi awayekî berfireh tê organîzekirin û pîrozkirin. Îro mewlîd, bûye bûyerek girîng ku gelek hêmanên olî û çandî yên jiyana civakî dihewîne. Di vê lêkolîna ku di bin navê “Kevneşopîya Mewlîdê li Nav Kurdan û Rola Wê Di Edebiyat û Çanda Kurdî De (Bi Mînaka Kurdên Tirkîyê)” hat kirin de ev encamên jêrîn hatin bidestxistin:

1. Di nav kurdên Tirkiyê de mewlîd bi taybetî di rojbûna Pêxemberê me (s.a.w) de tê pîrozkirin, her weha tê pîrozlirin di her kêliyên şahî û xemgîniyê de, wek dawet, mezûnbûn, kar, sinet û sersaxiyê.

2. Mewlîda yekem a ku bi kurdî hatiye nivîsandin, mewlîda Mele Huseyn Ertûşî ye ku tê texmînkirin ku di navbera sedsalên 6-17 an 17-18 de jiyaye. Paşê gelek mewlîd bi zaravayên Zazakî, Soranî û Kurmancî hatine nivîsandin. Heta îro ji 60î zêdetir Mewlîdên Kurdî hatine nivîsandin. Lê di gelek ji wan de, çi ji aliyê naverok û çi jî ji aliyê şeklê ve, bandora mewlîda Bateyî tê dîtin.

3. Mewlîd bi giştî ji van beşan pêk tê: pesn û şikir, afirandina ji ronahiyê û afirandina gerdûnê, afirandina Adem û şandina wî ji ezmanan bo ser rûyê erdê, nesla Resûlê Xwedê (s.a.w) , şemail, îsra û miraç, munacat û dûa.

4. Hemû mewlîdên Kurdî bi nezm hatine nivîsandin. Piranîya wan jî di prosodîya *fâʻilâtun/fâʻilâtun/fâʻilun*de hatine nivîsandın û bi hunerên xwe yên edebî yên wekî teşbîh û îstîare û kînaye û cînas û tîbâk kedeke mezin di warê edebî de dane ziman.

5. Ji bo ku cihên mewlîdê paqij û bîhnxweş bin, xwedyên mewlîdê û kesên ku diçin mewlîdê jî ehemmîyetê didin ku cil û bergên xwe yên paqij li xwe bikin û bêhneke xweş di xwe bidin.

6. Di merasîmên mewlîdê de, ji ber ku komînek heye, her tim xwarinek an jî şîranîyek tê pêşkêş kirin. Kevneşopiyek gelên herêmê ye ku ji bo mêvanperweriyê ji wan re îkramekê pêşkêş bikin. Dema mijar mewlîd be, girîngî zêdetir tê dayîn vê xusûsêde. Lêbelê, celebê pêşkêşkirinê li gorî dem û cîhê cûda dibe. Mînakî, xwarinên sereke yên ku bi piranî tê têne pêşkêş kirin, xwarinên bi goştin û carna jî şîraniyên wekî kek û paste û biskuwîtanin.

7. Kesê ku mewlîdê dixwîne bi gelemperî îmam e. heger feqyên mela jî beşdarî mewlîdê bibin, ji bo teberrukê pêşî îmam dest pê dike û piştre feqî didomînin. Di beşa merhab û dûayê de dîsa ji îmam re tê dayîn û ji aliyê wî ve tê qedandin. Dema ku kesê ku dê mewlîdê bixwîne cihê wî digre, li ser tepsiyek an jî li ser sifreyek qumaş li ber wî xwarinên cûrbecûr ên bi navê "teberik" tên danîn.

8. Adet e ku mewlîd bi xwendina sureyek kurt dest pê dike. Piştî ku selewatek jî tê dayin dest bi xwendina mewlîdê tê kirin. Dema ku tê ser beşa selewatê, bi hev re û bi dengekî bilind sê selewat tên dayin.

9. Di nav mewlîdên herî zêde kut ê bijartin mewlîda Bateyî ye. Di warê xwedîbûna zimanekî xweş û têgihîştî de, mewlîdên Şêx Mihemed Emîn Heyderî, Mihemed Zahîd Qardeşlîk, Mele Silêman Qurşun, Mele Mustefa Êzdari u Mewlîda Ehmedê Xasî jî di nav mewlîdên bijarte de ne. Her wiha bijartina kesê mewlîdê dixwîne yan jî yê mewlîdê dide jî girîng e.

10. Merasîmên mewlîdê, ji ber ku xizm û dost û cîranan tînê cem hev ji aliyê civakî û hevgirtinê ve geleki girîng e. Her çiqas mijar ne diyar be jî, di nav gel de her tim kevneşopiyek heye ku werin cem hev û li ser vexwarinek an xwarinekê sohbet bikin. Lêbelê ku ev kombûn ji bona jidayikbûna Pêxemberê me bê, vê yekîtiyê xurt dike û coşa sohbetê zêde dike.

**Pêşnîyaz**

Divê mewlîd weke wacibeke olî ya ku divê bê pîrozkirin neyê dîtin. Ji ber vê yekê, ji aliyê dînî ve ne dîwaneke rast e ku malên ku mewlîd tê de nehatibê xwendin bêbereket e yan ji kesên ku mewlîd ne dabê gunehkar bê hesibandin. Her wiha zêdekirina hêmanên curbecur li merasîmên mewlîdê bi destnîşankirina taybetiyên olî tê wateya teslîmkirina mewlîdê ji xurafeyanre. Lê hewldanek ji bo bi temamî dijayetiya mewlîdê ku bûye karê olî û çandî yê civakê û ji holê rakirina wê jî dibe sedema kêmbûna kelecan û kelecana ji dayîkbûna Pêxemberê me. Ji bo vê yekê bi hêmanên wekî bi eşq û coş bibîranîn û pîrozkirina jidayikbûna Pêxemberê me, zikr, selewat, nimêj, dûa, ikrama mêvanan, alîkariya feqîr û belengazan ku mewlîd bê pêşxıstın, geleki girînge ji âlîyê zêdekirina evînê û hezkirina bawermendan ji Pêxember û coşa civakî de. Her weha girîng e ku merasîm xwedî aliyekî ku li zarokan dinêre hebe. Girîng e ku em wan davet bikin û wan tevlî gûhdarîkirin û dâyina selewatên bilind bikin û bi tiştên ku jê hez dikin werin ikram kirin, wan li ser sifra xwarinê rûnînin ji bo ku hezkirina wan a Pêxember zede bibê.

Pêwîst e mewlîd hêdî hêdî û zelal were xwendin, mewlîdek ku civat ji hêla ziman ve hêsantir têbigihîje hilbijêrin, xwe ji meqam û şêwazên xwendinê yên ku wate û naverokê paşguh dikin û têgihîştina wê zehmet dikin dûr bixin. Xwendina mewlîdê bi zelali û têgihîştin û digel ravekirina cihên girîng dema pêwîst be, tê wateya hînkirin û bibîranîna siyer a Pêxember, ku ji bo armanc û ruhê mewlîdê guncantir e.

**Jêder û Çavkanî**

Akçay, H. (2013). “Son Dönem Tasavvuf Âlimlerinden Şeyh Muhammed Emîn el-Hayderî”. *Sempozyûma Uluslararası Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler*, Weşanxaneya Zanîngeha Çewlîkê, Çewlik 07-09/09/2012.

Akın, A. (2019). *Mewlîda Mela Sîraceddînê Xelîlî û Berawirdkirina Wê Bi Mewlîda Mela Huseynê Bateyî Re, Teza Lîsansa Bilind a Neweşîyayî*, Zanîngeha Artuklûyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2019.

Bateyî, Huseyn, (b.t.). *Mewlîd*. Stenbol: Ayfa.

Batergizî, M.Ş. (b.t.). *Rîsâletu'l-usûl fî mewlîdî'r-Resûl*. Nusxeya neçapkirî.

Curcânî, S.Ş. (1985). *et-Taʿrifât*. Beyrut: Mektebetu'l-Lubnan.

Çağmar, M.E. (2004). *Edebi Açıdan Arapça Mevlidler*, Ankara: Weşanên Îlahîyat.

Doskî, T.İ. (2015). "Jêderên Mewlîda Melayê Bateyî". *Sempozyûma Uluslararası Beytüşşebap ve Molla Hüseyin Bateyî*, 20-21 2014, Şirnex.

Efe, A. (2009). 'Türk Toplumunda Mevlid Merâsimlerinin Yeri ve Fonksiyonları (Isparta Ve Çevresi Örnegi)'. *Kovara Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Dokuz Eylulê,* XXIX/2009, rr. 9-30).

el-Ezherî, M. (b.t.). Tehzîbu'l-luga, thk. Ya'kûb, 'Ebdunnebî, Qahîre: ed-Dâru'l-Misriyye.

Ertekin, M.Z. (2011). "Di Edebîyata Me de Mewlîd û Rûberûkirina Mewlîdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî", *Konferansa Uluslararası Kürdoloji*, Zanîngeha Colemêrgê, Çewlik.

Ertekin, M.Z. (2015). "Mewlîda Kurdî ya Yekem û Bandora Wê li Ser Mewlîdên Din", *Sempozyûma Uluslararası Beytüşşebap ve Molla Hüseyin Bateyî,* 20-21 2014 Şirnex.

Ertekin, M.Z. û Ertekin, N. (2017). "Kurtedîroka Mewlîdnameyên Kurdî", Kongreya Şarkiyat Uluslararası Sosyal Bilimler, 14-17 Îlon Diyarbekir, rr. 149-155.

Êzdârî, M. (2014). *Mewlîda Şerîf (Rehberê Xelâsî)*. Stenbol: Banga heq.

el-Hâşimî, S.A. (t.y.). *Cevâhiru'l-belâga*. Beyrut: el-Mektebetu'l-'asriyye.

Hedbî, B. (b.t.). *Mewlîda Kurdî bi Şîvâzâ Hedbî*. Nusxeya neçapkirî

Heyderî, M. E. (2015). *Mevlîdu'n-Nebî (Tuhfetu'l-Heyderî)*. Diyarbekir: Mekteba Seyda.

Îbn Xellikân, A. (b.t.). *Vefeyâtu'l-a'yân ve enbâu ebnâi'z-zemân*. thk. İhsân 'Ebbâs, Beyrut: Dâru Sâdir.

Îbn Menzûr (b.t). *Lisânu'l-ʿEreb*. Beyrut: Dâru Sâdir.

Îbnu't-Tuveyr K. (1992). *Nuzhetu'l-mukleteyn fî ahbâri'd-devleteyn*. Thk. Eymen Fuâd Seyyid, Beyrut: Dâru Frantis Shtanyir Stutgard.

Heqqî, İ. M. (b.t.). *Mewlîd (Bexçâ Gulâ Ji Bo Feqyê Melâ)*. Nusxeya neçapkirî.

Karacan, H, û Aykut N. (2015). "Mele Hüseynê Bateyî'nin Mewlîd-i Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun'un Mewlîda Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması", *Enstîtuya*

*Kovara Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê*, Sal: 1, Cild: 1, Hejmar: 2, Sermawez, rr. 123-141.

Kardeşlik, M. Z. (b.t.). *Mewlîd*, Nusxeya neçapkirî.

Kızıl, H. (2012), 'Diyarbakır ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi', *Kovara Lêkolînên Zanistî ya Sarkîyat*, Hejmar: VII, rr. 116-150.

Kurşun, S. (2010). *Mewlîda Pêxember*. Stenbol: Beroj.

Özel, A. (2004). "Mevlid". *DİA*, Enqerê: Weşanên Weqfa Diyanetê ya Tirk.

Öztürk, M. (2018). "Folklorik Bir Ritüel Olarak Mardin'deki Mevlit Merasimleri ve Çeşitli Özellikleri". *Kovara Navneteweyî ya Lêkolînên Civakî*, Vol: 11 Issue: 5, rr. 81-90.

Sabri Paşa, E. (2004). *Mir'âtu'l-Haremeyn eş-Şerîfeyn ve cezîreti'l-'Arab*. Trc. Muhammed Harb, Qahîre: Dâru'l-ma 'ârifi'l-Arabiyye.

et-Teftâzânî, S. (2013). *el-Mutavval*. 3. Baskı, Beyrut: Dâru'l-kutubu'l-'ilmiyye.

Tıraşçı, M. (2013). "Güneydoğu ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları", *Kovara Fakulteya Îlahiyatê ya Zanîngeha Cumhuriyetê*, Cild XVII, Hejmar: 2 rr. 219-236.

Xelîlî, S. (2009). *Mewlîda Kurmanci*, Stenbol: Dua Yayıncılık.

Xursî, M. (b.t.). *Nezma Şêrîn der Mewlîd û Sîreta Resûlê Emîn*. Nusxeya neçapkirî.

Zinarexî, A. (b.t.) *Mevlîdu'n-Nebî*, Nusxeya neçapkirî.

**Çavkaniyên Bijî (Sal, Wezîfe, Bajarên ku wan agahî dane û tarîxên hevpeyivînê hatine dayîn.)**

Abdülhalim Akkoyun: 45 salî, mela, Kızıltepe, Diyarbakır (Dîroka Hevpeyvînê: 18 Kanûn 2022).

Ahmet Tekin: 43 salî, akademîsyen, Şırnak, Mardin (Dîroka Hevpeyvînê: 20 Kanûn 2022).

Ali Akçay (Seyyid Ali): 75 salî, seyda, Şanlıurfa, Mardin, Batman (Dîroka Hevpeyvînê: 20 Kanûn 2022).

Hamit Salihoğlu: 50 salî, akademîsyen, Diyarbakır (Dîroka Hevpeyvînê: 10 Kanûn 2022).

Mahsum Hamzaoğlu: 37 salî, muftî, Kocaköy, Bingöl, (Dîroka Hevpeyvînê: 21 Çile 2023).

Mehmet Deniz (Mele Mihemed): 72 salî, Seyda, Kızıltepe, Diyarbakır (Dîroka Hevpeyvînê: 13.01.2023).

Mehmet Tarhan (Mele Sîrac) : 57 salî, Seyda, Kızıltepe (Dîroka Hevpeyvînê: 11 Çile 2023).

Musab Koparal: 35 salî, akademîsyen, Adıyaman (Dîroka Hevpeyvînê: 22 Çile 2023).

Omer Akcay: 35 salî, mela/vaîz, Diyarbakır, Siirt, (Dîroka Hevpeyvînê: 19 Çile 2023).

Diyadin Çelik (Mele Diyadin): 60, mela/seyda, Diyarbakır (Dîroka Hevpeyvînê: 20 Hezîran 2017)

Mahsum Aslan: 45, akademisyen, Van, Hakkari, (Dîroka Hevpeyvînê: 10 Tebax 2023)

Sabahattin Bala: 46, akademîsyen, Mardin, (Dîroka Hevpeyvînê: 23 Çile 2023).

Şeyhmus Temel (Mele Şêxmus): 43, mela, Mardin (Dîroka Hevpeyvînê: 10 Tebax 2023).